
MAM CELAL

74 PIRS



Amadekar

Rêbwar Star

Wergêr

Emîr Hesen

Deng

Emîr Hesen


Melek Ehmed

Silêmanî

2025

Mam Celal

Di Bersiva 74 Pirsên Derveyî Siyasetê De



Amadekar: Rêbwar Star

Wergêr ji soranî: Emîr Hesen

Gotara Wergêr

Xwendevanên Hêja:

Berî xwendina vê pirtûkê, ya ku ji hevpeyvîna Radyoya Melbenda Rêxistina Silêmaniyê ya YNK'ê digel xwedê jê razî **"Celal Talebanî"** pêk tê, ez dixwazim bala we bikişînim ser vê yekê ku ji ber hebûna hejmareke navên erebî di nav pirtûkê de û ji bo parastina awayê bilêvkirina wan, ez neçar bûm ku di nivîsîna wan de rêzikên rastnivîsa kurmancî berçav negrim û hinekan li gorî rêzikên gramera îngilîzî binivîsim.

Her wisa di nivîsîna navên erebî de, ji ber nebûna şûngira tîpa erebî ya "eyn = ع" ê di kurmancî de, min li hinek cihan tîpa kurdî ya "**i**"yê û li hinek cihan jî dabir (') bi kar aniye, da ku bi awayekî navînî ew kêmasî were çareserkirin, mînak:

Se**i**dûn(سعدون), Be**i**s (بعث), El-Mezre'e (المزرعه), Es'ed (ئەسعەد/ اسعد).

Her wisa ji bo ku şaşî di navbera "**heta**" ya kurdî û "**hetta** (حتى)" ya erebî de çênebe ya erebî wek xwe bi tîpa dubare "tt"yê (he**tt**a) hatiye nivîsandin.

Hevalên hêja, bêguman tu berhemek bê kêmasî nabe; lewma ez rica dikim eger her şaşî yan kêmasiyekê bala we kişand, an her pêşniyarek we hebû, hûn bi rêya e-maila jêrîn dikarin ji min re bişînin.

emirmilan2016@gmail.com

Vekolê ziman û rojnamevan

Emîr Hesen (Amir Milan)

Cotmeha 2025'an

Naverok

Pêşgotin 05
Agahdariya weşandina hevpeyvînê 10
Ev hevpeyvîn çawa û çima hat kirin? 11
74 pirs û bersivên Mam Celal 16
Hejmarek wêneyên Mam Celal 67

Parvekirina Pirtûkê li Gorî Xelekên Dengî

Pêşgotin 05
Xeleka -1 16
Xeleka -2 26
Xeleka -3 39
Xeleka -4 51

Pêşgotin

Jiyannameya **Serok Mam Celal** ji zarê wî bi xwe û bi rêya 74 pirsan, ji aliyê Rêzdar Rêbwar Star ve tê amade kirin, ku di he-vpeyvîna sala 2000 de jê hatine kirin û ji aliyê Radyoya Melbenda (an Navenda) Rêxistina Silêmaniyê ya YNK'ê ve hatiye qeydkirin û ji arşîva wê radyoyê hatiye wergirtin.

Paşê ew hevpeyvîn ji aliyê beşa ragihandinê ya Buroya Rêxistina YNK'ê ve hatiye nivîsandin û Kekê "Dîdar Letîf" edîtoriya wê kiriye û Kekê "Helo Celal" jî dîzayn kiriye.

Niha hevalê me, Rêbwar Star dixwaze vê berhemê wekî pirtûk bide weşandin û bi CD'yeke dengê Mam Celal bi xwe belav bike. Wî pêşniyar kiriye, ez pêşgotinekê ji vê pirtûkê re binivîsim; min jî bi serbilindî qebûl kir û min got:

"Nivîsandina pêşgotina pirtûka jiyannameya serkirdeyekî mezin ê Kurd, Iraq û deverê ji bo min şerefeke mezin e."

Jiyannameya wî serkirdeyê bêhempa yê dîroka gelê Kurd bi rêya bersivên wan 74 pirsan tê nivîsandin yên bi awayekî rasterast jê hatibûn kirin.

Nivîsandina jiyannameya xwedê jê razî "Mam Celal" bi zimanê wî bi xwe ji bo xwendevan, lêkol, siyasetmedar, têkoşer û en-damên YNK'ê, Pêşmergeyên Kurdistanê û akademîsyenên Kurd, Ereb û Fars, her wisa partiyên siyasî yên Başûr, Bakur, Rojhilat, Rojava û rewşenbîrên Kurdistan û Iraqê xwedî girîngiyeke taybet e.

Ji bilî ku dibe çavkaniyeke bêhempa da ku nifşên niha û yên bê li ser kesayetiya têkoşer û serkirdeyekî wiha mezin ê Kurd, Kurdistan, Iraq û deverê xwedî agahî bin, ji bo lêkolînan jî dibe jêderek bingehîn.

Eger em profîla Serok Celal Talebanî bi profîla serkirdeyên dîrokî yên cîhanê yên serdema Şerê Sar û piştî wê re, bidin ber hev, **derdikeve ku ew xwediyê profîleke pir mezin û girîng e.**

Her wisa eger em kesayetiya wî, bi serkirdeyên dêrîn ên dîrokê wekî (George Washington, Mahatma Gandhi, Jawaharlal Nehru, Mao Zedong, Vladimir Lenin, François Mitterrand, Cemal Ebdul Nasir, Olof Palme, Winston Churchill ... hwd) yên serdema Şerê Cîhanê yê Yekem û Duyem re bidin ber hev, **ne tenê tiştekî Serok Mam Celal ji wan serkirdeyan kêm nîne ku navê wan heta-hetayê bi zindî dimîne, belkî bi nêrîna min profîla Mam Celal gelekî ji profîla piraniya wan serkirdeyan dewlemendtir e.**

Çimkî **rewşenbîrî, wêrekî, fedakarî, dûrbînî, wefadarî, bîr û nêrîn, mirovperwerî, baweriya bi mafê çarenivîsê ji bo tevahiya gelên bindest** û bi taybetî ji bo gelê Kurd (ku di tevahiya jiyana xwe de ji bo wê armanca pîroz xebat kiriye); her wisa **baweriya wî ya tam a bi mafê jinan, desteberkirina mafên wan, wekheviya za-yendî û îsrara wî ya li ser misogerkirina azadiyê di tevahiya waran de, ji taybetmendiyên herî girîng yên Mam Celal têne hesibandin.**

Her wisa Mam Celal di warê dîroknasiyê û tevahiya wan qadên girîng de, şoreşvanekî pêşeng, rêşikêner û bêhempa bûye.

Ji aliyê kesayetiyê ve, Mamê rêber di cîhanê de bêmînak û re-wşenbîrekî bêhempa bûye. Rojnamevanekî jêhatî, parêzerekî bi

şiyan, siyasetmedarekî mezin, pêşmerge û fermandarekî leşkerî yê mezin bûye. **Li gorî hemû pîvanan, ew mirovekî mezin ê dewletmedariyê û dîplomatekî tam bûye, danûstankarekî bêhevta û nivîskarekî mezin bûye.**

Li ser bingeha tevahiya wan taybetmendiyên ku di kesayetiya Mam Celal de civiyabûn, **em nikarin serkirdeyekî din di dîrokê de peyda bikin ku xwediyê heman xisletan be.**

Ji ber wê yekê, **girîng e ku profîla vî mirovê mezin bê nivîsandin, lêkolîn li ser bên kirin**, da ku ji aliyê rewşenbîr, siyasetmedar, endamên YNK'ê û dîroknasan ve, rêbaz, xebat, têkoşîn, bîr û nêrînên wî bên nirxandin û mifa jê bê girtin û bi nifşên niha û yên bê, bidin nasîn. **Ev nîşan dide, Kurd jî di dîroka mirovahiyê de xwedî rêberekî wiha mezin û bêhempa ye.**

Gotin û vebêjiya jiyana Mam Celal ji zarokatiyê heta qonaxa herî dawî ya xwendinê, çawaniya destpêkirina xebata siyasî, leşkerî û pêşmergetî û qonaxên din ên jiyana wî, mirov hînî berxwedan û xebatê dike.

Ez bawer im ku di wan 74 pirsan de, Kekê "Rêbwar Star" nekariye dest bixe ser tevahiya aliyên jiyana wî.

Serperestiya vî karê bi nirx û girîng bi Saziya Serok Celal Talebanî, bi taybetî jî bi min hatiye sipartin. Em dê dest bi komkirina tevahiya arşîv, berhem, xebat û destkeftiyên vî mirovê mezin di hemû warên jiyana wî ya bi dirêjahiya 70'ê salên têkoşînê bikin, ku mîna rûpeleke bêhempa û bi nirx ji dîroka gelê Kurd û serkirdeyên mezin tê qebûlkirin.

Min ew berhema Kekê “Rêbwar Star” xwend, tevî ku ez bi beşeke pir mezin a jiyana Mam Celal a bi dirêjahiya zêdetirî 50 salan re bûme û ji nêzîk ve şahidê jiyana vî mirovê mezin bûme, lê dîsa jî xwendina wê berhemê, ez pir kêfxweş kirim.

Ji bo vî karê bêhempa, ez ji kûrahiya dil ve destxweşiyê li Kekê Rêbwar Star dikim û bawer im, ku dê sûdeke mezin bigihîne endamên YNK’ê, têkoşer û neviyên me, her wisa şopa vî karî dê her dem bimîne.

Hêvîdar im, mînakên wî zêde bibin û rewşenbîrên din ên Kurd, çi hevnêrîn û çi jî hevxebatên Mam Celal, li ser bîr û bawerî, kar û têkoşîna vî mirovê mezin binivîsin û lêkolînên zanistî yên bi sûd li ser bikin.

Careke din jî, ji ber vî karê hêja, ez destxweşiyê lê dikim, mînakên wekî wî zêde bin.

Her dem şad û serkeftî bin
Balyoz Dr. Mihemed Sabîr



Dr. Mihemed Sabîr – Serok Mam Celal

Belavkirina Nûçeya

Weşandina hevpeyvînê di rojnameya Kurdistanî Nwê de 26.12.2000 Hejmar 2339


NO.2339 Tuesday 26/12/2000

مام جه‌لال له‌باره‌ی هێندێك
لایه‌نی ژیانی خۆی بۆ رادیۆی
مه‌ڵبه‌ندی سلێمانی دووا

ئێـــواره‌ی رۆژی (۲۵/۱۲)، هـــه‌ڤاڵ مام جـــه‌لال
له‌گفتوگۆیـــه‌کی رادیۆیـــی له‌گـــه‌ڵ رادیـــۆی مه‌ڵبـــه‌ندی
سلێمانیدا له‌باره‌ی هێندێك لایه‌نی تایبه‌تی ژیانی خۆیـــه‌وه
بۆ گوێگرانـــی رادیۆکه دووا، که گفتوگۆکه ســـه‌عاتێکی
خایاندو بڕیار وایـــه ســـه‌عات ۱۱ای ســـه‌رله‌به‌یانی یه‌کـــه‌مین
رۆژی جه‌ژن له‌به‌رنامه‌ی (ژوانگه‌یـــه‌ك بۆ ئێـــوه) لـــه‌رادیۆی
مه‌ڵبه‌ندی سلێمانییـــه‌وه پـــه‌خش بکرێت.

Mam Celal êvara roja 25.12.2000’ê di hevpeyvîneke radyoyî de, bi Radyoya Melbenda Silêmaniyê re derbar hinek aliyên jiyana xwe ji guhdarên radyoyê re diaxive.

Hevpeyvîn demjimêrekê dikişîne û roja baştir 26.12.2000’ê, demjimêr 11’ê berî nîvroya roja yekem a Cejna Remezanê di bernameya “**Jiwangeyek Bo Êwe**” de, ji aliyê Radyoya Melbenda Silêmaniyê ve tê weşandin.

Her wisa heman rojê ango 26.12.2000’ê, di rojnameya **Kurdistanî Nwê** de jî tê weşandin.

Ev Hevpeyvîn
Çawa û Çima Hat Kirin?

Dengê Melbenda Rêxistinê ya Silêmaniyê, radyoya herî baş a Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê (YNK)'ê bû, ku baregeha wê li bajarê Silêmaniyê bû.

Tevî nûçe û mijarên siyasî, komek bernameyên hunerî, zanistî, werzişî, edebî û civakî li ser pêlên **FM**/**AM**, ji aliyê vê radyoyê ve dihatin weşandin.

Yek ji bernameyên radyoyê taybetî hevpeyvînên bi berpirs û kesatiyên naskirî re bû, bi navê "**Jiwangeyek Bo Êwe**" ku tê de bal dihat kişandin ser jiyana mêvanê bernameyê û di wê çarçoveyê de, hejmarek pirsên derveyî siyasetê ji wî/wê dihatin kirin, di hember de mêvan jî bersivên pêwîst didan.

Di wê çarçoveyê de stafa bernameyê bi pêwîst zanî, bernameyekê bi xwedê jê razî "**Serok Mam Celal"** re çê bike, bi wê armancê ji **Omer Seyîd Elî** hat xwestin, ku pêşniyara hevpeyvîneke radyoyê bi Mam Celal re rê bixe.

Piştî ku ew pêşniyar ji aliyê Mam Celal ve hat qebûlkirin, biryar bû roja duşemê 25'ê Kanûna sala 2000'ê, demjimêr heftê êvarê roja erefata Cejna Remezanê, bername bê qeydkirin û demjimêr 11'ê pêşnîvroya roja paştir di yekem roja cejnê de, bê weşandin.

Stafa bernameyê ku li mala Mam Celal amade bû, pêk dihat ji: Perî Yûsif, Sazan Mihemed, Aryan Ehmed û Rêbwar Star.

Tevahiya amadekariyan hatibûn kirin û 74 pirs hatibûn amadekirin da ku Mam Celal bersiva wan bide.

Piştî ku Mam Celal pêşwaziyeke germ li wan kir, got: “Vê êvarê min du demjimêr ji dema xwe taybetî we kiriye,” di hember de stafê bernameya xwe da nasîn, ji aliyê xwe ve Mam Celal jî destxweşî li wan kir.

Paş hingê stafê pirsên ku hatibûn nivîsandin dane Mam Celal, wî jî got: **“Ev çi ye?”**

Stafê gote Mam Celal: “Pirs in; da ku berî destpêkirina bernameyê wan bixwînî.”

Mam Celal jî keniya û got: **“Xêr e, her divê kopiyê bikin?’’**

Stafê daxuyakirin: **“Dema diçin cem her berpirsekî destpêkê daxwaza pirsan dike.”**

Mam Celal jî got:

“Dema hûn diçin cem her berpirsekî pirsan nedinê, eger daxwaz kir bêjinê; bi fermana Mam Celal, nabe pirs pêşwext werin destnîşankirin.”

Mam Celal çend pirs derbarê bernameyê kirin, ji stafê pirsî: “Çima ev nav li bernameyê hatiye kirin û armanca wê çi ye?” Piştî wergirtina bersivan, Mam Celal got:


“Baş e, em dest pê bikin lê şertekî min heye, eger hûn pirsên siyasî ji min bikin, ez ê we bixim zîndanê.”

Stafa bernameyê jî got: **“Gelek baş e, lê eger te bersivên me siyasî dan û te kişand ser siyasetê?”**

Mam Celal got: ***“Wê demê min ceza bikin.’’***



Stafa qeydkirina hevpeyvînê
ya Radyoya Melbenda Rêxistina
Silêmaniyê ya YNK'ê



Serok Mam Celal - Rêbwar Star



Ji aliyê rastê ve yên li pişt:

Elî Biçkol, Omer Seyîd Elî, Erselan Bayîz, Mam Celal, Aso Şêx Nûrî

Ji aliyê çepê ve yên li pêşiyê:

Şehîd Cebar Ferman û Ebdul Rezaq

74 Pirs û Bersivên Mam Celal

❖ Em bizanin navê Mam Celal yê sêyanî çi ye?

Bersiva Mam Celal:

Navê min Mam Celal e, ez kurê Şêx Hisamedîn kurê Şêx Nûrulla kurê Şêx Xifûr Talebanî me (li cihê sê navan, min navên pênc bavên xwe ji we re gotin).

❖ Kengê Mam Celal ji dayik bûye?

Bersiv: Sala ji dayikbûna min bi serastî nehatiye destnîşankirin, dayika min xwedê jê razî be, keseka nexwendewar bû û çi tiştek ji vê yekê nedizanî, bavê min jî sala ji dayikbûna min ne-nivîsandibû.

Dayika min digot: **“Salekê piştî ‘Filsê Sor’ ku sala 1932’yan bûye.”** Bi vî awayî sala ji dayikbûna min dibe sala 1933’yan. Dayika min digot: “Tu li demsala Havînê hatî dinyayê.” Ji bilî van tu tiştekî din nedizanî. Tevî ku hinek dibêjin 1934, hinek dibêjin 1932, hinek jî dibêjin 1930, **lê bi nêrîna min her sala 1933’yan ne**, bi taybet li gorî salên ku ez çûme xwendinê ku sala xwendina 1941-1942’yan bûye.

❖ Kê navê te kiriye Mam Celal?

Bersiv: Bavê min, navê min kiriye Mam Celal ku çîrokeke wê, bi vî awayî heye.


Apekî bavê min bi navê “**Celal**” hebûye, ku jê re gotine “Mam Celal”. Wî di temenê xortiyê de wexera dawî kiriye. Beriya ku ez ji dê bibim, di xewna bavê min de, ew apê wî sêvekê didê.

Piştre bavê min behsa xewna xwe ji meleyê gund re dike, mele jî dibêje: “Van deman ji we re kurek dibe.” Ew jî dibêje: “**Eger kurekî me hebe, ez ê navê ‘Mame Celal’ lê bikim.”**

Piştî ku ez ji dê dibim, navê min dike “**Mam Celal**” nago navê “Mame Celal” li min dike. Ji ber wê yekê, her ji zaroktiyê ve ji min re gotine “Mam Celal”, her wekî hinek kesan ku navê wan Babe Şêx e yan Kake Sûr e, navê min jî Mam Celal e.

❖ Tu li ku derê ji dayik bûyî?

Bersiv: Ez li gundekî bi navê “**Kelekanê**” ji dayik bûme ku dikeve qûntara çiyayê Kosret, aliyê gola Dûkanê.



Wêneyek taybet a Mam Celal

❖ Xwendewariya te di çi astekê de ye?

Bersiv: Min her dû qonaxên dibistana destpêkê û ya navîn li bajarê Koyeyê xwendine. Di dibistana destpêkê de ez yekemê tevahiya parêzgehê bûm, ji ber wê yekê dixwestin min bişînin Koleja "**Melîk Feysel**", ku wê demê yekemê parêzgeha me, belaş werdigirt, lê ji ber siyasetê ez neçûm wê kolejê.

Saleke qonaxa xwendina lîseyê min li Hewlêrê û salekê jî li Kerkûkê xwend û pêncê lîseyê min li Kerkûkê temam kir.
Piştre min li Koleja Hiqûqê ya Bexdayê dest bi xwendinê kir, heta sala çarê, li wê salê ji ber fermana girtinê ez reviyam.
Wê demê ez endamê Polîtburoya PDK'ê bûm ji bo karûbarên partiyê. **Heta Şoreşa 14'ê Tîrmehê, ez veşartî li Silêmaiyê dimam.**

Dema Şoreşa 14'ê Tîrmehê qewimî, fermanek bi navê "Zehifê'' ji aliyê xwedê jê razî "**Ebdul Kerîm Qasim**" ve hat derxistin.
Li gorî fermanê, xwendekarên ku salek xwendina wan mabû, dikarîn ji biryara "Zehifê" mifayê werbigrin û bêyî ku wê salê bixwînin, yekser bibin parêzer, **lê min ev nekir û sala çarem a kolejê xwend, hinek caran min henek dikir û digot: "Naxwazim bêjine min parêzerê Zehifê."**
Di encamê de, sala 1959'an min kolej temam kir, bi vî awayî dikarim bêjim, ez derçûyê gera yekem a koleja hiqûqê ya Iraqê ya Zanîngeha Bexdayê me.

❖ Rewşa civakiya Mam Celal çawa ye?

Bersiv: Xwedan malbat im, hevjîn û du kurên min hene.

❖ **Kurên te navên wan çi ne?**

Bersiv: Yê mezin navê wî Bafil û yê biçûk navê wî Qubad e. Navlêkrina wan ji ber hinek sedeman bûye. Navê Bafil ji bafila (şirava) çemê Rêzanê hatiye girtin, di qonaxa yekem a Şoreşa Îlonê (1961- 1963)'yan de, ez fermandarê tevahiya wê deverê bûm. Cihekî gelek xweş ê çemê Rêzanê heye, ku jê re dibêjin: "Bin Bafilê" ango bin şiravê.

Yê din jî, min navê têkoşerekî îranî lê kiriye, ku navê wî "Qubad" bû, kesekî leheng û jêhatî bû, hevalekî me yê hêja bû. Hat girtin û di bin êşkenceyê de canê xwe ji dest da.


Ji



rastê ve:

Bafil Celal Talebanî, Mam Celal, Qubad Talebanî

Şahiya zewaca Qubad Talebanî



Mam Celal

Digel Milazm Omer, Şehîd Azad Hewramî, Dilêr Seyîd Mecîd

❖ **Gelo bîranîneke te xweş a zaroktiyê heye dema ku xwendekar bûyî?**

Bersiv: Mebesta te ji xweş çi ye?

❖ **Yanî bîranîneke te ya xweş a serdema dibistana destpêkê heye?**

Bersiv: Çend bîranînên min ên serdema dibistana destpêkê hene. Heta çar- pênc saliyê, ez li gund jiyam, lê piştre mala me çû Koyeyê, ji ber ku bavê min bû murşidê Tekiyeya Talebanî li wî bajarî.

Li wê, min dest bi xwendinê kir. Sala yekem gelek nexweş derbas bû. Çimkî hevalan henekên xwe li zimanê min dikirin. Wek mînak

min li cihê (lo) digot: “Le bo” yan li cihê (çon) min digot: “Çilon” wan jî henekên xwe li zimanê min dikirin.

Sala yekem ji ber van peyvan ez diketim şermê û di encamê de gelek nexweş derbas bû. Lê ji ber ku xwendekarekî jîr bûm, hêdî hêdî reftara hevalan bi min re hat guhertin. Mamosteyan jî gelek hejî min dikirin, her wisa hevkariya min jî dikirin. Ji ber wan sedeman reftara xwendekarên hevsinifê min jî hat guhetin.

Li wê derê min gelel tişt liber dikirin, çimkî di warê liberkirinê de, ez xwendekarekî jîr bûm, hevdem di warê hunerê de jî, têra xwe hebûm.

Min di rêûrisma sibehan de, helbest dixwend. Zêdetir min helbestên neteweyî dixwandin, him li dibistanê û him jî li malê, ku ez ji mamosteyan hîn dibûm.

Têkiliyên min û mamosteyan gelek baş bû. Yek ji yên min nas dikirin, Mamoste “Mecîd Efendî Şêx Nûrî” bû, mamosteyê dersa dîrokê bû ku bandoreke wî ya gelek mezin li ser pêşketina mejiyê min hebû. Di nav mamosteyan de, Mamoste “Kemal Ebdul Qadir Neşet” ku mamosteyê werzişê bû, bandoreke wî ya mezin a siyasî li ser me hebû û em ber bi siyasetê ve dibirin.

Em du-sê heval bûn, bi vê hincetê ku em kiribûn berpirsên qeydkirina pereyê tênîsa ser maseyê, xwe li me nêzîk dikir û hêdî hêdî em kişandine nav siyasetê, rojekê di mala xwe de komeleyek bi navê “**Komeleya Pêşketina Xwendewariyê** (**KPX**)” ji me re ava kir.

Di encama wan karên Mamoste “Kemal Ebdul Qadir Neşet” de em fêrî siyasetê bûn, wê demê ez sinif pêncê dibistana destpêkê bûm.

Sala 1946’an ji rêya mamosteyekî xwe bi navê Tahîr Seyîd ku kesekî xwedan şiyan û jîr bû, ez bûm endamê PDK’ê. Di bîra min de ye, tevî ku wê demê ez di qonaxa destpêkê de bûm, lê wan mîna hevtemenên xwe, bi min re serederî kirin.

Çîrokeke xweş a wê salê heye. xwedê jê razî Seyîd Qezaz Parêzgarê Hewlêrê bi fermandarê leşkerî yê Iraqê li Hewlêr re, di serdana bajarê Koyeyê de, serî li dibistana me jî da, wê demjimêrê dersa me ya dîrokê hebû, ku tê de behsa Mêdhet Paşa û reformên wî hatibû kirin.

Ew hatin sinifa me, ji ber ku ez di rêza pêşiyê de bûm, ez rakirim şipê, da ku bizane navê min çi ye? Û derbarê wê dersê pirs ji min kirin. Min jî behsa Mêdhet Paşa û reformên wî kir, her wisa çendîn pirsên din jî li min kirin, ku min bersiva hemiyan da.

Piştre got: “Navê te çi ye?”

Min jî got: “Filan e.”

Got: “Tu kurê kê yî?”

Min got: “Ez kurê Şêx Hisamedîn Talebanî me.”

Serê xwe hejand û got:

“Talebanî du babet in, xeta wan a navîn nîne.”

Bi vê çîrokê, yek din jî hat bîra min, çawa ku dibêjin axaftin, axaftinê tîne. Sala 1951’an li Hewlêrê ez sala çarê lîseyê bûm, bê ceribandin derbasî sinifa pêncê bûm, çimkî tevahiya nimreyên min li ser 90’î re bûn.

Vê yekê jî bêjim: Ji sinifa yekê heta çarê lîseyê min tu cerbandin nedane, ji ber ku hemî salan li ber efûyê diketim, lewma ez vegeriyam Koyeyê, lê ez hatim girtin û piştre hatim sewqkirin ji bo Neynewayê. Wê demê xwedê jê razî Seyîd Qezaz parêzgar bû.

Di nav wan kesên ku hatibûn sewqkirin de, xwedê jê razî Omer Debabe, Ewnî Yûsif hebûn, her wisa Qadirê Hacî Hisên jî hebû ku xelkê Silêmaniyê û nanpêj bû û ji rûyê siyasî ve endamê PDK'ê bû.

Tevî ku biryar bû, wek sewqkirî yên siyasî, em rojê 100 filsan werbigrin lê du meh bûn, ew pereyê me nedabûn. Bi wê armancê, em çûn avahiya parêzgehê, da ku îtirazê bikin.

Dema em gihîştin avahiya parêzgehê, xizmetkarek ku mirovekî feqîr bû û bi behdînî diaxivî, pêşwazî li me kir, lê got: **"Carê bisekinin, balyozê Tirkiyeyê mêvanê parêgar e."**

Qadirê Hacî Hisên jî got:

"Bêje parêzgar, balyozê Kurdistanê hatiye."

Ji ber sadeyiya xwe, ew jî wê gotinê ji parêzgar re dubare dike, lê parêzgar dibêje, bila bendê bin, heta balyozê Tirkiyeyê diçe. Dema em derbasî odeyê bûn, parêzgar pirsî:

"Yê gotiye balyozê Kurdistanê ye, kî ye?"

Qadirê Hacî Hisên got: "Ez im qurban."

Wî jî got: "Tu kî yî?"

Bersiv da: "Ez Qadirê Hacî Hisên im, mala me nêzîkî mala we bû, wê demê te nan ji napêjiya bavê min dikirî."

Parêzgar got: "Keko tu karkerê partiyê yî?"

Wê demê "Kake Felah" hebû komunîst bû, li Silêmaniyê bi navê "Kake Kirêkarî Partî"(Kekê Karkerê Partiyê) dihat naskirin.

Paş hingê pirs ji me hamiyan kir û got:

"Kîjan ji we Omer Debabe ye?"

Kekê Omer got: "Ez im."

Parêzgar got: “Ez wiha rêzê li we digrim, lê eger hûn werin ser desthilatê, hûn ê çi li me bikin?”

Omer got: **“Em ê we bidin destê dadgeha gel.”**

Sal derbas bûn, dema Seyîd Qezaz hat girtin, radestî dadgeha gel hat kirin, gelek kesan dixwestin Kekê Omer biçe û li hember dadgehê li ser wî şahidiyê bide, lê ew neçû.

Piştre nobeta min hat û parêzgar got: “Ew simêl- stalînî kî ye?”

Wê demê simêlê min pan bû, gotin: “ filan e,” got:

“Celal were pêş wî simêlê te yê stalînî, ez şaş kirim” Û got: “Bîra min tê, dema tu biçûk bûyî.”

Belê bûyera sala çarê dibistana destpêkê, di bîra wî de bû.

Got: **“Tu ji Talebaniyên aqil bûyî, çi tiştekî tu kişandî nav siyasetê?”**

Min bersiva û got:

“Dibe ku her aqilî bûye sedem da ku bikevim nav siyasetê.”

Belê wî daxwaza me gihand encamê, hezar rehmet lê bin.

Got: “**Hûn bi dûv kumê babirî ketine,**” berdewam kir û got: **“Kurdistan çawa rizgar dibe? Kî dikare Silêmanî, Mihabad, Kirmaşan û Diyarbekirê bi hev re girê bide? Kîjan terziyek dikare van perçeyan bi hev re bidirû? Biçin bixwînin û karê xwe bikin.”**

Bi kurtasî tevî ku wî daxwaza me qebûl kir, gotinên xweş jî ji me re kirin.

Ez behsa tiştekî din jî bikim, hevalekî me hebû bi navê “Hisamedîn Teyîb,” ji me mezintir bû, rehma xwedê lê be, naznavê wî “Şeib” bû, em hinî kurdatiyê dikirin, ji me dixwest, bi

şevê em biçin goristanan. Wî şevê em diceribandin û alayek Kurdistanê dida me û digot: “Biçine li filan goristanê daynin.”

Wê demê goristanên bajêr, diketin derveyî Koyeyê, her wisa goristana Tekiyeya Kevin jî her li derveyî bajêr bû û diket aliyê Heybet Sultan. Pêwîst bû şevan ez alayê bibim wê goristanê ku hinekê jî dûr bû û ketibû ser girekî.

Piştî ku şev ez çûm goristanê, dema vegerê polîsan ez girtim û birim cem memûrê Heyeyê, wî ez nas dikirm, ji min pirsî: “Vê nîvê şevê tu li vir çi dikî?”

Min jî got: “Ez çûm ser gora kesekî da ku fatîheyê bixwînim.”

Sibeha roja baştir, alaya Kurdistanê li goristanê hat dîtin, tevî ku wan dizanîn min ew kar kiriye, lê ez negirtim. Belê ev sê bûyerên serdema zaroktiya min bûn.



Mam Celal

Li Festîvala Ciwanan û Xwendekaran li Moskowê 1957



Mam Celal

Di dema pêşmergetiyê de li çiya

❖ Dema xwendinê tu mamosteyekî li te daye?

Bersiv: Erê wele, navê mamosteyekî me Hena Efendî bû, zilamekî baş bû lê li ser siyasetê em qir dikirin, carekê me gelek av ri-jandibû, wî bangî min kir û du şiv (dar) li destên min dan.

Mamosteyekî me jî navê wî Mihemed Tofîq Werdî bû, nizanim li ser çi wî zileyek li min da. Ez xeyidîm û neçûm dibistanê. Mala wan cîranê me bû, piştre hat pey min û got: “Ez şaş bûme,” ez maç kirim û destê min girt û birim dibistanê.

❖ Kê di mal de tu hînî helbestên niştimanî dikirî?

Bersiv: Bismamekî min heye navê wî Kake Sûr e, wî em hînî liberkirina Quran û helbestan dikirin, ji bilî helbestên niştimanî,

wî em hînî wan helbestan jî dikirin ku pesnê malbata Talebanî didan, ji ber ku em malbateke Talebanî bûn li Koyeyê.

Cîranekî me bi navê Hacî Efendî hebû, piştre şehîd bû. Bandoreke wî jî li ser jiyana min hebû. Her wisa Hacî Ebdul Baqî yek ji wan kesan bû "**Zeîm Sidîq"** di 10'ê Hezîrana 1963'yan de bi saxî çal kirin, ew jî cîranê me bû.

Hacî Efendî zilamekî xwedan bîr û pêşketinxwaz bû, em bi wan re yekmal bûn, bandoreke wî jî li ser min hebû, ez hînî helbestên niştimanî dikirim. Ji bilî mamostayên me, Hacî Efendî ku wek xizmekî me dihat zanîn, digel Kake Sûr e, ez hînî helbest û edebiyatê dikirim.

❖ Di zaroktiyê de dexla te ya pereyan hebû?

Bersiv: Na wele, her gavê ku min pere werdigirt, gelek zû dida pirtûk û kovaran, wekî Kovara "**Gelawêjê**".

Ji pêncê dibistana destpêkê, abûneya min a rojnameya "**El-Ehalî**" hebû, ji ber wê yekê tevahiya pereyan, min didan kovar û van tiştan. Pirtûkxaneyeke min bi xwe jî hebû. Her wisa du pirtûkxaneyên min jî hebûn; yek ji wan li Koyeyê bû ku ya partiya komunîst bû, ya din pirtûkxaneya Hacî Qadirê Koyî, ku ya cemaeta partiyê bû. Destpêkê abûneya min a Koyeyê hebû ku min ji bo abûneyê 100 fils didan.

Mamosteyekî me yê komunîst bi navê Fatih Resûl hebû, wî baxçeyek çêkiribû û li ser bîr û baweriya komunîzmê em perwerde dikirin. Rojekê min jê pirsî: **"Gelo Kurd netewe ye yan na?"** Got:

“Nexêr, Kurd netewe nîne, lewma mafê Kurd ê diyarkirina çare-nivîsê jî nîne.”

Ji ber wê yekê navbera me têk çû, êdî ez li wê pirtûkxaneyê nemam û çûm pirtûkxaneya Hacî Qadirê Koyî ango xeta PDK’ê. Belê min pereyên xwe di van tiştan de xerc dikirin.

❖ Di serdema zaroktiyê de te hejî çi lîstikekê dikir?

Bersiv: Guh bide, di temenê 8-9-10 saliyê de, ez zarokekî gelek har bûm. Baxçeyekî mezin ê Tekiyeyê hebû, min gelek hejî wan lîstikan dikir ên tê de rev hebû, wekî lîstika bi topê. Lê di dibistanê de tenê ez hînî lîstikekê bûm, ew jî Pîng Pong bû, tevî ku min lîstikên din nedizanî lê di dawiyê de, min baş Pîng Pong dilîst.

❖ Ji bilî kirîna pirûk û kovaran, pereyên te ji bo sînemayê jî dima?

Bersiv: Sînema li Koyeyê nebû, hinek ji wan pereyan min didan wan heval û xwendekaran ên ku hejar bûn.

❖ Di zaroktiyê de te hest bi ferqa navbera xwe û zarokên din dikir?

Bersiv: Hinekê taybetiya min a nazkirinê hebû. Wê yekê hinekê ez cuda dikirim. Li dibistanê jî ji ber ku di hemî sinifan de yekem bûm, xwendekarekî jîr bûm, kesekî gelek civakî bûm, zaf têkilî xelkê dibûm, lewma zêde cudahî navbera min û xelkê nebû, her tim bi hevalan re bûm, bi taybetî hevalên xwendingehê.

❖ Di şeva Beratê de tu jî wekî zarokan digeriyayî?

Bersiv: Belê di şeva Bertê de geriyame û tişt jî min wergirtine. Her wisa di şerê taxê de jî ez beşdar bûme.

❖ Di temenê ciwaniyê de hesta te ya evîndariyê hebûye?

Bersiv: Belê, ez ji wan têkoşeran bûm, ku wekî sofî û derwêşan perwerde bibûn, dema me bi rastî wiha bû, pêwîst bû wekî siyasiyekî, xwedan xûy û exlaqekî bilind bûyayî, keç û kur wek xwişk û birayên te bûna. Me vexwarina meşrûbê eyb dizanî, lîstina qumarê wekî xwe sivikkirin û biçûkkirinê didît. Belê diyar e, her yek ji me dema digihîje temenekî dilê wî lê dide.

❖ Xwendekarên li tenişta te rûdiniştin kî bûn?

Bersiv: Yek ji wan xwendekaran ku bi salan em bi hev re bûn "**Wirya Elî Kanî Maranî"** ye, ku niha Cîgirê Serokê Dadgeha Pêdaçûnê ye. Em bi hev re bûn endamê PDK'ê, piştre jî em bi hev re bûn. Hevalekî min ê din hebû û navê wî Cemîl Xoşnaw bû, ku zû emrê Xwedê kir.

Yekî din navê wî Cemal Tahîr bû, yekî din navê wî Fewzî Omer bû. Koma hevalên **Komeleya Pêşketina Xwendewariyê** (**KPX**) nêzîkî 70 xwendekaran bû, ên her dû xwendingehên "Ewla û Saniye" ku me jê re digot: "Xwarê û Serê."

Ev 70 xwendekarên endamê komeleyê ku yên sinifên pêncê û şeşê bûn, hemî heval û dostên min bûn.

❖ Xwendekarekî har hebûye ku te xwestibe cihê xwe ji tenişta wî biguherî?

Bersiv: Her tim ez berpirsê disîplîna sinifê bûm, lewma min ji xwendekaran dixwest rûnên û aqil bin. Me wekî mezinan reftar dikir, me hez dikir em zû jî mezin bibin.

❖ Tu bîranîneke te ya yekê Nîsanê heye?

Bersiv: Di yekê Nîsanê de bîranîneke min a gelek ecêb heye. Salekê li Şamê bûm, hevalekî min bi navê Ebû Temîm hebû, endamê Rêveberiya Neteweyî ya Partiya Beis bû. Sibeheka zû ya yekê Nîsanê min telefonî wî kir û got: “Ebû Temîm te radyo vekiriye?” Got: “Na wele.”
Min gotê: “Li Bexdayê darbe ye.”
Got: “Çi?!”
Min gotê: “Radyo marşê lê dide.”
Wî jî sebir nekiribû da ku radyoyê veke, yekser telefon ji koşka komariyê re kiribû, gotibû: “Serok Hafiz Esed agadar bikin li Bexdayê darbeye bûye.”
Gotibûn razaye, wî gotibû ji xewê rakin, wan jî Hafiz Esed ji xewê rakiribûn. Dema Serok Hafiz Esed Radyoya Bexdayê vedike, dibîne dengê xwendina Quranê belav dibe.

Telefon dike û dibêje: “Ebû Temîm dengê Quranê ye û tu tiştên din nîne.” Ebû Temîm jî telefonî min kir, min jî gotê: “Keko yekê Nîsanê ye! Haj pê nînî?” Bi vî awayî, min kumekî baş xiste sêrî.



Ji rastê ve:

Seyîd Ezîz- Mam Celal

❖ Di kurdî û erebî de tu hejî dengê kîjan stiranbêjan dikî?

Bersiv: Min wekî ciwanên wê serdemê guhdariya stiranan nedikir, ji nav stiranên erebî, kêyfa min ji dengê Ebdul Wehab re dihat. Hevalekî min bi navê Qadirê Kake Ziyad hebû, ku emrê Xwedê kir. Navbera me gelek xweş bû, me bi hev re malek li Hewlêrê girtibû, wî gelek hejî dengê Mihemed Ebdul Wehab dikir.

Çawa ku pêştir min got, wê demê ez wekî sofiyan bûm, min guhdariya stiran û van tiştan nedikir.

Wî jî got: “Bavo guh bidê û bizane çi ye?” Wê demê min teze pirtûkek Stalîn xwendibû û tê de li ser hunerê dibêje:

“Huner endazyariya ruhê mirovan e.”

Ji wê yekê têgihîştim ku divê girîngiyî bidim bi hunerê. Min jî êdî guhdarî kir, carekê bi tesadif min guhdariya stiraneke Ebdul Wehab bi navê (Ya Care el-wadî) kir. Bi rastî gelek xweş bû, him ji ruyê awazê û him jî wateyê, dengî wî jî xweş bû.

Ji wê demê ve, min bi berdewamî guhdariya stiranên Ebdul Wehab ji ereban dikir, gelek kêyfa min ji wê re dihat. Wê serdemê rola kesên wekî **Nazim Xezalî**, **Om Kelsûm** û **Sebah** berçav hebû.

Salekê ez li Kerkûkê bûm çavê min dêşiya, çûme wê derê. Sala 1964’an fîlmek hebû, wisa bizanim navê wê (Elqelbû lehû Wahêdon) bû, dibe ku min 10 caran temaşeya wê fîlmê kirbe, çimkî tu tiştek nebû, hemî caran diçûm, stiranên Sebahê bi dilê min bûn.

Piştî **Feyrûz**, ji yên Iraqê, min gelek hejî dengê **Zohre Hisên** dikir. Niha jî li bal min kasêtên wan hene û guhdarî dikim.

Di nav dengbêjên Kurd de, gelek kêyfa min ji dengê Kawûs Axa re tê. Dengê **Kawûs Axa**, **Tahîr Tofîq**, **Salih Dîlan** û **Seyîd Esxerê Kurdistanî**, gelek bi dilê min bû.

❖ Di rê de yan dema kar an jî di nav otomobîlê de, hez dikî stiranan bêjî?

Bersiv: Belê, ez distirêm. Dixwazim tiştekê bijime te. Xwendekarê dibistana navîn bûm li Koyeyê ku wê demê li derveyî bajêr bû, min gelek hez dikir dema baranê bi çetrê bimeşim.

Hevalekî min bi navê Xalîd Dilêr hebû, ew xalê Nermîn Xana me ye. Tevî ku zimanê Kekê Xalîd dema axaftinê lal dibû lê dema stirangotinê, zimanê wî gelek saf bû. Her tim dema baranê, em bi hev re dimeşiyan, min çetir digirt, wî jî stiran digot. Carna hinek ji stiranên wî, ez di ber xwe de dubare dikim. Yek ji wan ev e:

Xwaye weten awekey çend dilgîr û şîrîne
Ey kurdîne, ey merîne

❖ **Navbera te û gul û çîçekan çawa ye?**

Bersiv: Ez gelekî ji wan hez dikim û hebûna wan jî pir bedew dibînim.

❖ **Navbera te bi teyr û balindeyan re çawa ye?**

Bersiv: Navbera min û wan zêde xweş nîne.

❖ **Navbera te û werzişê çawa ye?**

Bersiv: Wele hez dikim xelk bike, lê ez bi xwe nakim.

❖ **Tu zêde kîjan werzişê hez dikî?**

Bersiv: Ez bi xwe hejî pêgermokê (meşê) dikim. Ji bo xwe pêgermokê ji hemiyan baştir dizanim, tevî ku ez gelekî avjeniyê hez dikim, lê mixabin avjenîkirinê nizanim. Temaşeyî tevahiya lîs-tikên din jî dikim. Di vê baweriyê de me, werziş gelek girîng e, ji ber vê yekê, ez pişta **Komîsyona Olîmpiyadê** û werzişên cur bi cur digrim. Li gorî min mifaya wê ji bo gelek tiştan heye û divê di nav civakê de, girîngî pê were dayîn û pêşxistin.

❖ Gelo Mam Celal qet şerê bi berfê kiriye?

Bersiv: Belê, min ew şer kiriye.

❖ Çi demekê te şerê bi berfê kiriye?

Bersiv: Dema xwendina dibistana navîn û dema em li çiya bûn, min şerê bi berfê kiriye. Di pêşmergetiyê de, li min dane, di çiya de firset ketiye destê hevalan û bi topên berfê li min dane.

❖ Lê li Silîmaniyê?

Bersiv: Nexêr, min li Silêmaniyê şerê bi berfê nekiriye.

❖ Cenabê te kengê Hêro Xan nas kir?

Bersiv: Ez Hêro Xanê ji dema zaroktiya wê ve nas dikim. Sala 1950'yan, ez hatim Silêmaniyê; Mamoste Hemze, xalê wê taze ji girtîgehê azad bibû, ew hatibû dîtina Mamoste Hemze. Min li wê derê Hêro Xan dît, wê demê biçûk bû.

Paş hingê bavê Hêro Xanê jî azad bû. Wê salê ez li Kerkûkê bûm. Her wê salê bavê wê sewqî Kerkûkê bibû. Şeva ku birayê wê Helo ji dê bû, Mamoste Îbrahîm em vexwandibûn mala xwe, ez û Salih Dîlan çûn mala wan, wê demê Hêro Xan zarok bû, sê-çar salî dibû.

❖ Îja çawa bû hevjîna te?

Bersiv: Pêştir min çend caran ji bo pêkanîna hevjîniyê hewl dabû, lê çi ji wan serî negirtin. Herî dawî hevalên me pêşniyar kirin,

rehma xwedê lê be, kesê yekem ku pêşniyara wê ji min re kir, Hilmî Elî Şerîf bû, gelek pesnê wê da. Got:

“Ji bilî ku keça Mamoste Îbrahîm Ehmed e, hinek taybetiyên wê bi xwe jî hene”.

Êdî sala 1967’an, em çûne xwazginî û di **14.04.1967’an** de me nîşan kir.

❖ Çawa ku te got, malê nazê te dikişandin, dibe em bizanin daweta te bi çi awayî bû?

Bersiv: Çi dawetek ji min re nekirin, ez û Hêro Xan bi rengekî modêrn zewicîn. Wisa bizanim mehreya pêşîn û paşîn a me yek dînar bû. Piştî veguhestinê, tenê me gereke derveyî welat kir. Bi hev re em çûn Lubnanê, Brîtanya û Fransayê, tiştek ji vê zêdetir me nekir.

Piştî wê yekê her tim Hêro Xanê digot: **“Tu şahiyekê ji min re deyndar î,”** heya Bafilê kurê me ji dayik bû, me cejnek mezin li Qahireyê jê re saz kir. Min gotê: “Ev beşa te jî (beşa te jî di vê şahiyê de heye).”



Hêro Xan û Mam Celal

❖ **Têkiliya te bi hevalên zaroktiyê re çawa ye, navê hinekan bêje, eger niha jî hevalên te ne?**

Bersiv: Têkiliya min bi tevahiya wan kesan re yên ku min nas dikirin, bi taybetî nivşa ku me bi hev re siyaset dikir, bi temamî baş e. Wekî mînak Kekê **Wirya Kanî Maranî** Cîgirê Serokê Dadgeha

Pêdaçûnê, digel hinek hevalên din ku niha naxwazim navên wan bînim, çimkî niha li bal me nemane.

Dostaniya min û wan hevalan yên di qonaxa dibistana navîn de, me hev nas kirin, niha jî dewam dike, hetta yên ku bîr û nêrîna wan bi min re ferq dikirin, mîna yên komunîst bûn.



Mam Celal

Digel şandeya opozisyona Iraqê li Lîbyayê

04.02.1983

❖ Te gelek cih dîtine, ew cih û gund çi tînin bîra te?

Bersiv: Ez hez dikim gundê "**Talebanê**" bibînim, min ew Taleban nedîtiye ku yê Talebanî ye, tenê min Talebanek dîtiye ku dikeve aliyê Koyeyê. Lê ew gundê Taleban, ku navê **Şêx Ehmed Talebanî** lê hatiye kirin ku dikeve rojhilatê Çemçemalê, min heta niha ne dîtiye.

❖ Silêmanî çi tîne bîra te?

Bersiv: Silêmanî gelek tiştan tîne bîra min; yekem bi rastî hişyarî, piştre siyaset, xebat, têkoşîn, xwe veşartin, şoreş û heta cihê dildariyê. Demekê min keçeka Silêmaniyê hez kir, wan hemî tiştan tîne bîra min.


❖ Hewlêr çi tîne bîra te?

Bersiv: Hewlêr, xebatê tîne bîra min. Tiştên resen tîne bîra min. Salekê ez li Hewlêrê xwendekar bûm, tevgera cotkaran tîne bîra min, çimkî li wir tevgera cotkaran hebû û têkiliya min bi wan re xurt bû.

Her wisa Riwandiz û Balekayetiyê tên bîra min ku ez ji bo vejandina rêxistinên PDK'ê çûm wan deveran, her wisa dostaniya hejmareke xelkê ku niha jî dewam dike.

❖ Bajarê Bexdayê çi tîne bîra te?

Bersiv: Ez gelekî ji bajarê Bexdayê hez dikim, yek ji wan bajaran e ku ji dil ve jê hez dikim, hinek caran ez vê helbesta **Cewahîrî** di ber xwe de dubare dikim ku dibêje:



Bexda bajarê xwendina min e, li wir min zanîngeh temam kir, dikarim bêjim: Salên kamiliya min li wir bûye, cihê pêşketina min a siyasî bûye, li wir ez hînî zimanê erebî bûme, li wir min Cewahîrî nas kiriye, li wir min komek ji kesatiyên mezin ên Ereb nas kiriye. Gelek tiştan tîne bîra min, bal min Bexda yek ji bajarên hezkirî ye.

❖ Bîranînên te yên bajarê Koyeyê?

Bersiv: **Koye landika perwerdebûma min e**, yekem xwendingeha jiyana min e. Bajarê siyasetê, hizr û exlaq e. Koye bajarekî gelekî zindî û nîştimanperwer û kurdperwer bûye; di dîroka gelê me de roleke wê ya gelek mezin hebûye.

Lewma her tim rikê dagirkeran lê hatiye, xwestine ji nav bibin, gelek plan kirine da ku lawaz û biçûk bikin, xelkê wê aware bikin, hetta plana rejîma Iraqê hebûye ku kavil bike.

Ji ber wê yekê, Koye li bal min bajarekî hêja û hezkirî ye.



Mam Celal, Hêro Xan, Mihemed Mehdî Cewahîrî Şamê

❖ Çi bîranînên te yên navçeya Zelê hene?

Bersiv: Zelê navenda şoreşê bû. Dema ku em çûn Zelê, tekane cih bû ku em di destpêka şoreşê de hewandin, çimkî li ser sînor bû, li ser rêya çiyayê Mamend bû, xelk jî lê nebû, em li wê derê bi cih bûn.

Her gavê ku Zelê tê bîra min, sitargeha min tê bîra min, cihê sitarbûna me bû. Ji bilî wê yekê, bi rastî li wê derê di salên dijwar ên xebatê de, bîranînên me yên xweş hene, salên dijwar ên xe-

batê gelek xweş in, ku encam jî hebe. Tama wê derê xweştir e ji tama vê derê ya rehetî û sadeyiyê.

❖ Wek te behs kir çend Taleban li Kurdistanê hene?

Bersiv: Yek ji du gundên li Talebanê, her wisa sê Talebanên mezin û biçûk jî, li nêzîkî Teqteqê, Talebanek jî li rojhilatê Çemçemalê heye.

❖ Yanî tu xelkê Talebana aliyê Çemçemalê yî?

Bersiv: Ez ji malbata Talebanî me. Talebanî bi xwe ne eşîr in, da ku tu bizanî, hemî ji zilamekî çêbûne, ku navê wî "**Mela Mehmûd Zengene**" bûye.

Mela Mehmûd Zengene li wî gundî û li wê Talebanê jiyaye, "**Şêx Ehmedê Hîndî**" hatiye Kurdistanê, niha gora wî li Sûrdaşê ye. Mela Mehmûdê Zengene bûye xelîfeyê wî Şêx Ehmedî û çûye Bexdayê û li mala wî jî maye.

Piştî ku Şêx Ehmed wexera dawiyê kiriye, li şûna wî bûye xelîfe û kurekî wî çê bûye, navê wî kiriye Şêx Ehmed, navê wî Şêx Ehmedî, lê kiriye, heft kurên vî Şêx Ehmedî hebûne, ku yek ji wan kuran bapîrê me ye.

❖ Eger di bîra te de mabe, cîranê we yê herî kevin kî ye û li ku derê bûye?

Bersiv: Cîranên me yên herî kevin li Koyeyê bû, li aliyekî mala Heme Axa, mala Ziyad Axayê rehmetî, cîranekî me yê din jî mala Hewêz Axayê Hewêzî rehmetî bû. Li aliyê din jî, mala Hacî Salihî

Koye bû, mala Kekê Fendî bû, her wisa mala yek ji axayên Koyeyê bû, jêre mala Fethulla Axa digotin. Ev cîranên me bûn.

❖ Gelo cenabê te qet kirêçî bûye?

Bersiv: Yanî kirê wergirtibim an kirê dabim?

❖ Yanî te kirê dabe?

Bersiv: Ez her tim di kirê de bûme, mala min bi xwe nebûye, dema ku min dibistana navîn temam kir ku çûm Hewlêrê, li wê kirêçî bûm, çûm Bexdayê kirêçî bûm, elhemdulîlah di temenê xwe de tu tiştekî min nebûye.

Ji wê demê ve ku YNK'ê mal daye min, ez êdî kirêçî nînim, eger na her tim kirêçî bûme.

❖ Çend sal in te pere hilnegirtiye?

Bersiv: Min pere hilnegirtiye da ku ez karê xwe pê bikim, bekî min hilgirtiye da ku bidim xelkê û ew karê xwe pê bikin. Eger biçim derveyî welat, pere bi min re hene, ez hildigrim û xerc jî dikim û tiştan jî pê dikirim, dema ku diçim gerê.

❖ Mam can tu şofêriyê dizanî?

Bersiv: Nexêr, tenê ez ajokariya tankan dizanim, çimkî ez zabitê tankan bûm û min **Koleja Efserî ya Yedek** temam kir, piştre, ez çûm xwendingeha leşkerî ya wesayîtên zirêhdar, li wir min mehekê dewreya ajotina tankan derbas kir. Ji ber wê yekê, ez dikarim tanê bajom, dibe ku bikaribim traktorê jî bajom, çimkî ajotina traktor û tanan mîna hev in, lê ez ajotina otomobîlê nizanim.



Mam Celal, Mamoste Îbrahîm Ehemd, çend kesayetî

❖ **Ji bajarên Kurdistanê yên te dîtine li her yekê çi taxekê zêde bala te kişandiye?**

Bersiv: Ez li wan bajaran ên ku ez lê mame, li Hewlêrê, ez her li Teyrawa mame, wê bala min kişandiye, li Kerkûkê ez li ber Tekiyeyê bûme, wê bala min kişandiye, li Bexdayê herî zêde ez li taxa "**Eqd el-Nesarî**" mame. Li Şamê jî taxa "**El-Mezre'e**", ku mala me jî her li wê derê bû.

Li Silêmaniyê jî, li du-sê cihan bûme, taxa ber Xaneqayê bala min kişandiye, Eqarî, taxek jî wê demê nebû lê niha heye, min li wê derê di mala xwedê jê razî Qadir Tegeranî de, xwe veşartibû. Ma-

la wî li derveyî bajêr bû, niha bûye taxa “Heware Berze” lê wê demê gelekî ketibû derveyî bajêr.

Silêmanî wê demê biçûk bû, nifûsa wê 25-30 hezar kes dibû. Bendavek hinekê dûr ji mala Şêx Celal Hefîd hebû, paş bendavê çol bû. Li destê çepê cihê perwerdeya Hêza Leşkerî ya Parastina Silêmaniyê bû. Li destê rastê jî Qadir Tegeranî xaniyek lê ava kiribû, li aliyê din jî çayxaneyek çê kiribû.

Wî xaniyê xwe li derveyî bajêr ava kiribû, çimkî bi xwe qaçaxçîtî dikir, ferş û tiştên wiha ji Îranê dianîn. Du salan min li wê derê odeyek girtibû û li wir dimam.



❖ Yekemîn pirtûkxane ku te pirtûk jê wergirtibe û wek çavkanî bi kar anîbe ku bû?

Bersiv: Pirtûkxaneya Koysinceq a Partiya Komonîst a Iraqê li Koye, ya din jî pirtûkxaneya Hacî Qadirê Koyeyî bû.

❖ Te pirtûk jê wergirtin?

Bersiv: Belê, wiha bû diçûyî te abone dikir û 100 fils didan û her pirtûkek te bixwesta te dikarî werbigrî û bibî û bixwînî.



Ji rastê ve:

Dr. Kemal Fuad, du kesayetiyên Ereb, Ehmed Çelebî û Mam Celal

❖ Tu pirtûk te ji bo nivîsandinê wernegirtin?

Bersiv: Nexêr, tenê ji bo xwendinê bû.

❖ Mam çi qasî ji helbestan bi giştî û yên kurdî bi taybetî hez dike?

Bersiv: Ez helbestan dixwînim, lê ya ku zêde bandor li min kiriye helbestên Cewahîrî ne. Bandora Cewahîrî zêde li ser min hebûye, him di hînbûna zimanê erebî û him jî di nivîsîna erebî de. Di kurdî

de jî, di serdema xortiyê de zêdetir bandora helbestên Hacî Qadir li ser min hebû. Pîremêrd û Hacî Qadir û Mamoste Îbrahîm Ehmed, tevî ku helbestên wî kêm in, lê gelek dewlemend, bi bereket, heyecan û bi wate ne. Wek "**Şîrîn Bihar e**" ku xwedê jê razî Tahîr Tofîq, bi dengê xwe yê zelal kiriye stiran. Di wê helbestê de tiştên pir wate hene, eger bi hûrî bala xwe bidêyî.

Ji helbestvanên vê serdemê, helbestên **Şêrko Bêkes** gelekî bi dilê min in. Tevî ku ez zêdetir hejî helbestên bi wezin û qafiye dikim heta helbesta nû, ya ku jêre dibêjin helbesta azad, lê helbestên Şêrko Bêkes him ji rûyê peyvan, nêrînan, wêneyan, him jî ji rûyê naverok û wateyan gelekî bilind in.

Bi nêrîna min, Şêrko Bêkes helbestvanê herî mezin yê seranserî dîroka Kurd e.

❖ Tu perçeyeke helbestê di xeyala te de heye ji me re bixwînî?

Bersiv: Yê kê?

❖ Yê her helbestvanekî ku niha di bîra te de be?

Bersiv: Gelek di bîra min de ne, yê Mamoste Îbrahîm Ehmed di bîra min de ne, yê Cewahîrî di bîra min de ne, yê Hacî Qadir di bîra min de ne, yê kê hez dikin, ez ji we re bêjim?

❖ Bi dilê xwe, kîjanê hez dikî bêje?

Bersiv: Baş e, Mamoste Îbrahîm helbesteke gelekî pir wate heye li girtîgeha Bexdayê, dema ku digel Salih Dîlan ceza li wan tê birîn, destê wan bi hev re kelebçekirî bûye. Destê du kesan kelebçekirî

bûye, li wir li girtîgehê helbestek gotiye, navê wê “**Tîra Dawî Ya Kevanê**” ye, ew helbest gelekî bi dilê min e, ez ê niha ji we re bêjim:



Wêneyek malbatiya Mam Celal Îbrahîm Ehmed Dr. Letîf Reşîd

Dwa tîrî kewanî xot bihawêje hele dujmin
Dwa serkewtinî toye dwa nukî gele dujmin
Şewî tirsandinit samî nemawe tarîk û rune
Be asoy erxewanîda hetaw lew dîw kelle dujmin
Çi gewcî heş beser key xor be hêllek pêşî gîrawe
We yaxod çerxî mêjû key be berdî êwe westawe
Hemû pêşkewtinêkî to berew çalî neman edbat
Hemû serkewtinêkîşit be wêney billqî ser awe

Niha ku dixwazim van ji te re şirove bikim, beriya ku ez temam bikim, wateyên gelekî bilind tê de ne, wek mînak, ev yek ji pendên sosyalîstî yên wê serdemê ye, ku dibêje:

Tevahiya pêşketinan, rejîma kapîtalîst li mirinê nêzîk dike, li dawîbûnê nêzîk dike, da ku qonaxa dawiyê derkeve, ku qonaxa sosyalîzmê ye, ji ber wê yekê di helbesta xwe de dibêje:

Hemû pêşkewtinêkî to berew çalî neman etba
Hemû serkewtinêkî be wêneyî Billqî ser awe
Ewa Hîtler xudawendî şerî ser rûyî zemîn bû xo
Qelay sermayedarî pirtefaqî asnîn bû xo
Hemû Elmanyay Nazî li desta wek nigîn bû xo
Le rêy azadîxwazana weku şûray Çîn bû xo
Kwa Vêrmaxtî elmanî ke etwot her zeruy xwêne
Kwa Luftwafe û ew hêze neparêze merg çêne
Kwa topî kwa tankî kwa ustulî bê wêne
Be carê gorî gum bû, giştî wek xoy bêseruşwêne
Le lay ême hellengutin yekem hengawî zalbûne
Le naw botey xebat da tiwandinewe her şertî qalbûne
Le nuçdan û hellengotin nîye bakî gelî kurdan
Weku rêgayî xebatî xoy şikanî toy lela rûne
Legel karwanî rizgarî gelan
Erwa be çalakî le dûrî rê û le sextî cê û drî dujmin nîye bakî
Ne ladan û ne koldan ne westan heye hergîz
Pişû nada heta nebrê regî çewsanewe û makî

Bizane ev helbest çend bi wate ye, yekem xebata Kurdan bi xebata gelan ve girê dide, bi karwanê rizgariya gelan re dimeşe bi çelengî, li dûriya rê û dijwariya cih û hêza dijmin natirse. Di nav xebata wê de jî, him rizgarbûna nişimanî û him çînatî heye, ranaweste heta rehê maka zilm û zorê raneke, heta çewsandin û rehê çewsandinê ji kokê raneke, ranaweste ji xebatê. Ev helbesteke pir bi wate ye.



Mam Celal
Gotûbêjek li Bexdayê 1963

❖ **Di civaka kurdewarî de gelek kevneşopî hene, ya herî bi-nirx bal Mam Celal kîjan e?**

Bersiv: Wele bal min mêvandarî, dilsozî, wefadarî, zilamtî û camêrî kevneşopiyên baş in. Kevneşopiyên kurdî yên xweşik gelek zêde ne, lê bi rastî ez zêdetir van dipejirînim.

❖ **Dema cilan li ber xwe dikî, lihevhatinê ber çav digrî yan ferq nake?**

Bersiv: Beriya ku ez û Hêro Xan dest bi hevjîniyê bikin, min bi xwe cilên xwe hildibijartin, lê niha ew ji min re hildibijêre.

❖ **Xweştirîn û bilezetirîn xwarin bal Mam Celal çi ye?**

Bersiv: Li bal min xweştirîn xwarin savar e, dibe ku ji bo xelkê cihê matmayînê be, lê savar li bal min pir xweş e, du-sê cure savar hene, savara şil heye, savara bi goşt heye, savara bê goşt heye, ya sêyem bal min xweştir e.

Serdemekê ez li mala Generalê xwedê jê razî Barzanî nêzîk bûm, wê demê mala wî li Bexdayê bû, têkiliya min bi wan re pir baş bû, ez yek ji wan kesan bûm ku diçûm nav mala Mela Mistefa.

Hevjîneka Mela Mistefa ya gelekî rêzdar heye, navê wê Hemayîl Xan e ku dayika Kekê Mesûd e, bi rastî jineka pir hêja ye, di kurdewariyê de, jinên wiha kêm hene, gelekî giran û delal e. Ez her carê ku diçûm mala wan, min hewar dikir û digot: “Hemayîl Xan min îro ji bo xwarina savarê xwe dawet kiriye bal we.” Ew jî dikeniya û digot: “Celal, xelk çawa xwe dawet dike?”

Min digot:“Wele min bi xwe, xwe dawet kiriye.”

Van salên dawiyê jî, ku ez çûm serdana Kekê Mesûd, min xwest Hemayîl Xanê bibînim, ew jî hat û got: “**Nîvro jî tu dawetî Celal, min savar ji bo te çê kiriye, digel xwarinên din.”**

Belê bal min savar yek ji xwarinên herî xweş e.



Serok Mam Celal di dema pêşmergetiyê de

❖ Navê çend xwarinên me yên kurdewarî dizanî?

Bersiv: Gelekan dizanim.

❖ Wekî?

Bersiv: Wek Qubulî, Pilav, Kifte, Kube, savar, Tirxêne û Dandok, nîsk û genimê kutayî.

Xwarin nîne, ku min nexwaribin an di pêşmergetiyê de, dema em diçûn malan û bi ser malan de parve dibûn, an jî min li mala me xwarine.

❖ Gelo Mam Celal dizane xwarinê çê bike?

Bersiv: Belê, ez dizanim xwarinê çê bikim.



Mam Celal
û
Bill Clinton
Brîtanya
1993



Mam Celal
û
Hêro Xan

❖ **Bi taybetî dizanî çi xwarinekê çê bikî?**

Bersiv: Ez Qubuliyê baş zanim çê bikim, bamiyê baş çê dikim, savar baş çê dikim, goştê biraştî baş dizanim û hinek xwarinên biyanî jî dizanim, ji bo zanîna we, **min Hêro Xan hînî çêkirina xwarinan kiriye**. Herin jê bipirsin, ew ê ji we re piştrast bike ku min ew hînî çêkirina pilavê kiriye.

Ez li zîndanê hîn bûm, dema ez xwendekar bûm û tenê dijyam, li çiya jî sala yekem, dema ez li **Çemê Rêzanê** bûm û hejmara me kêm bû, her min xwarin çê dikir.

❖ **Bi nêrîna te kîjan ji we xwarinê xweştir çê dike? Tu yan Hêro Xan?**

Bersiv: Niha Hêro Xan baştir e, dizanî çiye? Wekî vê yekê ye ku li dibistana destpêkê mamosteyê wê bûyî, lê niha ew xwendekarek e, zanîngeh temam kiriye yan master û doktoraya wê heye, wiha lê hatiye.

❖ **Zêde tizbiyan dikşînî, tizbiyê herî bedew bal Mam Celal kîjan e?**

Bersiv: Kezwan, tizbîyê kezwan li bal min pir bedew e.

❖ **Gustîl bi destê xwekirina zilaman çawa dibînî?**

Bersiv: Çawa yanî?

❖ **Niha piraniya zilaman salekî piştî hevjîniyê gustîla xwe derdixin?**

Bersiv: Xirab e, bi nêrîna min karekî xirab e, hez dikim gustîl di destê zilam de be, yên ku derdixin ji bo fêlbaziyê wê yekê dikin, an jî şerm dikin, lê her du jî xirab in. Qet min gustîla xwe dernexistiye, ji wê salê ve ku zewicîme, dema biçûk jî bûye, min her dernexitiye.Tenê ji bo paqişkirinê nebe.

❖ Ev gustîla te ya dema nîşankirinê ye?

Bersiv: Belê, ya wê salê ye dema ku min Hêro Xan nîşan kir.




Hêro Xan û Mam Celal

Ahenga rojbûna Bafil Celal Talebanî



Ji rastê ve:

Ehmed Turk, Mam Celal, Sekreterê Rêxistina Sosyalist a Cîhanê Silêmanî



Mam Celal, Hewlêr 1991

❖ **Di civînan de tu behsa serhatiyên xweş dikî, wan li ku derê bi dest dixî?**

Bersiv: Mebesta te henek û pêkenok e?

❖ **Pêkenok an serhatekiyeke xweş be?**

Bersiv: Ez bi xwe gelekî ji pêkenokan hez dikim, her wisa gelekî jî min dinya dîtiye, gelek tişt jî min xwendine, gelekî jî kovaran dixwînim, ji wan tiştan hîn dibim û bikar tînim.

❖ **Niha dikarî pêkenok an serhatiyeke xweş ji me ra vebêjî?**

Bersiv: Baş e, ka ez pêkenokek gelek ecêb ji we re vebêjim. Ez ji Lîbiyayê vegeriyam, Muemer Qedafî û hinek dostên me yên lîbiyayî cil dane min, cilên lîbî. Min jî biryar da ku cilên kurdî ji wan re bişînim, min ji Dr. Xidir birayê Dr. Fuadê me xwest ji min re 8-9 -10 şalên kurdî hazir bike, her yek bi curekî û bi rengekî be, min gotê: **“Ez ê wan şalan bişînim Lîbyayê ji bo wan dostan.”**

Dr. Xidir got: “Gelekî baş e.” Wê li ser kaxizekê dinivîse û ji Kekê Refîq Pişderî re dişîne (**xelkê Koye ji şalan re dibêjin ‘kir’**), jêre dinivîse û dibêje ew qas “kir” ji me re bişînin.

Sibehekê ku wê demê mala me ji du odeyan pêk dihat, odeyek a razana min û hemaê bû, ya din jî wekî ofîs û odeya mêvanan bû. Min dît 8-9-10 nêreker li pêşiya mala me dizîqin, ez ji ber dengê wan ji xewê hişyar bûm.

Min pirsî: “Ev çi ye?”

Gotin: “Wele Kekê Refîq şandine, min telefonî Refîq kir, wî demê telefona min hebû, min pirsî: “Keko ev çi ye?”

Got: “Min ker ji te re şandine”.

Min gotê: “Kerê çi?”

Got: “Himar, Himar (bi erebî yanî ker) ji bo ku gotina xwe tekez bike.

Min gotê: “Ev çawa dibe?”

Refîq got: “Dr. Xidir daxwaz kiribûn, her yek ji rengekî be.”

Bi rastî jî her nêrekerek bi rengekî bû. Ez jî gelek aciz bûm, çimkî Dr. Xidir carna henek û tiştên wiha dikir. Bi rastî min bi acizî telefonî Dr. Xidir kir û gotê: “Ev çi ye doktor, te çi kiriye?

Wî jî got: “Mam Celal, va ez tême bal te û bila ew jî were û kaxiza min jêre şandiye jî bîne, ku min jêre çi nivîsiye.”

Wele dema ku hatin, Dr. Xidir nivîsîbû (kir), lê Kekê Refîq “kir” wek “ker” xwendibû, çûbû li şûna 10 kiran (şalan) 10 ker kirîbûn.

Çîrokeke din ku ew jî her a Dr. Xidir e, dixwazim ji we re vebêjim. Cîgirê efserekî ereb li bal me bi dîl hatibû girtin, ew xelkê navçeya “Dûre” bû.

Carekê em çûne cem Îzet Dûrî, wî digot: **“Eger hûn axaftinên baş bikin, xelkê bi başî behsa we bike, eger hûn tiştên xirab bikin, xelkê bi xirabî behsa we bike.”**

Wî behsa vê çîrokê kir, ku ez ji we re vedibêjim.

Serok eşîra wî kurî yê ku ji aliyê me ve bi dîl hatibû girtin, jê dipirse û dibêje: “Kurê wan li ku hatiye girtin.”

Îzet Dûrî jî dibêje: “Muxeribîn ango têkderan ew girtine.”

Ew jî wisa fem dike “muxeribîn” eşîrek ji eşîran e û jê dipirse: “Ew ango “muxeribîn” li ku derê ne?”

Îzet Dûrî jî dibêje: “Li navçeya Şênê ya Qeladizê ne.”
Ew jî zilamekî ereb ê birêz bûye û bi “eba û egale”ya xwe ve, tê Şênê û Dr. Xidir diçe pêşiya wan, bi erebî dipirse mamo tu çi dixwazî?
Ew jî dibêje: **“Ez hatime cem serokê muxeribîn û mesele ev e.”**
Dr. Xidir jî dibêj: “Were te bibim bal serokê muxeribîn.”
Ew anîn bal min û ez dam nasînê û gotê: **“Ev serokê muxeribîn e”.**
Ez li ber wî rabûm, zilamê ereb got:
“Ey serokê muxeribîn karê zilaman bi zelam hedibe, zilam diçin cem zelaman, wele serokê muxeribîn, kurekî me li cem we girtiye û tu çi bixwazî ji bilî jinan, ji ber ku me jin nîne em bidin, eger na tu pere yan çekan dixwazî, em ê hemû tiştî bidin, tenê kurê me berde.”

Min got: “Serçavan, ez ê kurê te berdim.”
Min zanî ku ew wateya muxeribîn nizane û hatiye xapandin.
Min gotê: “Bi şertekî ku nanê nîvro gel me bixwî, ez niha dişînim da ku kurê te bînin.”
Wî jî got: “Serçavan”.
Dema ku kurê wî hat, destê bavê xwe maç kir û rûnişt.
Min jê re got: “Êdî tu azadî û tê biçî”.

Şêxê eşîrê gote min: **“Ey serokê muxeribîn, qenciya te qet ji bîra min naçe, vê camêriya te heta roja qiyametê ji bîr nakim, bi taybet ku tiştekî naxwazî.”**

Kurê wî serê xwe nêzîkî guhê bavê xwe kir, diyar bû jêre got: “Apo wiha nebêje.” Wele poşman bû û ji hikûmetê re da xeberan

û got: **“Lenet li wan were, wan em wisa hîn kirine, wele hûn muxe-rib nînin, hûn zilamên baş in”.**

Min gotê: “Tişt nabe.”

Piştre ku çûbû her civînekê, pesnê me dabû. Îzet Dûrî behsa wê çîrokê ji min re kir û got: **“Eger başiyê bikî wiha dibe”.**

Îzet Dûrî got:

“Ew serok eşîr li her civînekê rûdinişt pesnê we dida, heta ku rêveberiyên ewlekariyê jê re gotibûn here wî xizmê xwe bêdeng bike, bila êdî ew qasî pesnê wan ne de”.

Ew serok eşîr xizmê Îzet Dûrî bûye, lewma ji Îzet Dûrî xwestibûn jêre bêje: Ew propaganda çi ye ji YNK’ê û muxeribîn re dike, Îzet Dûrî got: “Ez çûme bal wî û min jê xwest ew qasî pesnê wan nede”.

Îzet Dûrî got:

“Wele dema ku ez bi ser wî de çûm, pesnê we dida”

Ez dîtim gotina xwe nebirî û bi dengekî bilind got: **“Wele Îzet jî hat, lê wele ew muxerib nînin, belkî zilamên camêr û gelekî baş in, dema ez çûm bal wan ango Mam Celal, ew gelekî camêr bû.”**

Îzet Durî jî jê re dibêje: “Apo ez hatime da ku ji tere bêjim, ew qasî propagandayê ji wan re nekî”.

Mebesta wî ew bû, eger mirov başiyê bike, xelk jî bi başî behsa mirov dike.



Mam Celal

Digel hejmarek pêşmerge û serkirdeyan

❖ Eger rahênerê tîma futbolê ya YNK'ê bî, tu dê ji nav endamên serokatî û polîtburoyê kê wek lîstikvan hilbijêrî?

Bersiv: Kes ji wan bi kêrî wê yekê nayê, ez kesî ji wan hilnabijêrim.

Ez ê wan bişînim nav tîma bajarê Silêmaniyê û tîmên bajarên din, da ku lîstikvanan bînin. Endamên serokatî û polîtburoyê bi kêrî golçîtî û tiştên wiha nayên, ew ne bi kêrî topê tên û ne jî bi kêrî golçîtiyê.

❖ **Mam wisa bizane destek şal û şapik li bejna te ye, cotek kilaş li piyê te de ne, derketî derve baran barî tû dê çi bikî?**

Bersiv: Wele gelek nexweş dibe, ez ê di xema kilaşên xwe de bim, ku dê ter bibin, hûn dizanin ku ter jî bibin, êdî bikêr nayên, ez ê xembar bibim. Eger çihek hebe ez ê di bin de bisekinim da ku baran li min nede yan jî eger teksiyek hat, ez ê bilez rawestînim û lê siwar bim, da ku bilez xwe bigihînim cihekî din.



Mam Celal û hejmarek kesayetî
Silêman Beg 1969

❖ Mam Celal ji çayê, şîr, qehweyê zêdetir hejî kîjanê dike?

Bersiv: Ez her şîr venaxwim, li çayê hez dikim, li qehwê jî hez dikim, lê bi rêjeyeke kêm. Ji bilî şîrê dayika xwe, min tu şîrekî din venexwariye.

❖ Em hez dikîn, behsa tiştekî navbera xwe û Cemal Axa bikî?

Bersiv: Demek e, ez Cemal Axa nas dikim. Cemal Axa têkoşerekî kevin yê vî bajarî ye, yek ji kesatiyên nişтimanperwer e, ku xwe nedaye alî û bi rastî nêzîkî 50'î salan e, li ser yek rêbazê û yek xetê xebatê dike. Heta bêjî zilamekî rast û jîr e.

Niha dixwazim behsa bûyereke navbera xwe û Cemal Axa bikim, gelek tişt di navbera me de hene, lê ez ê tenê yekê ji we re vebêjim.

Cemal Axa kiribû edet, her sal birinc ji Mamoste Îbrahîm Ehmed re dişand, ez jî dema ku li Silêmaniyê berpirsê PDK'ê bûm, hemî caran min ji Cemal Axa re digot:

"Baş e, ez diçim Kerkûkê, mala Kekê Omer Debabe li wê ye û mala Elî Eskerî jî li wê ye. Cîranê mala Mamoste Îbrahîm Ehmed, mala nemir Nûrî Şaweys e, çima ji bo wan jî naşînî?"

Cemal Axa jî digot: **"Mam Celal tu dixwazî her çi parsekên PDK'ê hene bi min xwedan bikî? Ev ji destê min nayê."**

Carekê ez ji Bexdayê hatim, min got:

"Cemal Axa silavên hemî hevalan ji te re hebû, mamoste Îbrahîm, Nûrî Şaweys û filan û her wisa Celal Hisamedîn, wî jî gelek silavên xwe ji te re hebûn."

Got: “Celal Hisamedîn kî ye?”
Min jî got: “Wele, ew gelekî xwe dostê te dizane.”
Cemal Axa got: “Bi xwedê ez wî nas nakim.”

Min gotê: **“Çawa tu wî nas nakî? Cemal Axa, ew xwe gelekî dostê te dizane? Ew dibêje: ‘Min dîtiye û Cemal Axa gelekî baş nas dikim û ez gelekî xwe nêzîkî wî dizanim,’ diyare tu li gelek cihan dîtiye.”**

Cemal Axa got: “Wî ez li ku derê dîtime?”
Min jî got: “Ew dibêje min li Kerkûkê, li Bexdayê, Silêmaniyê û li Zirguwêz dîtiye.”
Cemal axa avirek da û got: “Celal, ew tu nebî?
Min jî got: “Erê wele, ez im.”

❖ Mam can, gelo Cemal Axa bi çi aciz dibe?

Bersiv: Acizkirina Cemal Axa hêsan e, pesnê Hewlêrê bide û bi xirabî behsa Silêmaniyê bike, bi wê yekê aciz dibe, yan jî tu tiştekî nebaş derbarê hevalên wî yên kevin bêjî aciz dibe, çimkî gelekî ji hevalên xwe hez dike û gelekî biwefa û girêdayî hevalên xwe yên kevin e, yan jî eger tu pesnê helbesta nû bidî, aciz dibe û bi helbest nizane û dibêje: **“Bê wate ye.”**



Mam Celal
û
Cemal Axa

❖ Mam Celal di dawiyê de ji bo bajarê Silêmaniyê ci dibêje?

Bersiv: Tevahiya xelkê vî bajarî yê qehreman silav dikim, ku bi rastî him bajarê "**Helmet û Qurbanî**" him jî bajarê mîhrebaniyê ye, navekî nû jî, jê re peyda bûye.

Cara yekem Kekê **Cebar Ferman** behsa wî navî kir û got:

"Tevahiya wan kesan ên ku xelkê Silêmaniyê nînin û ji Xaneqîn, ji Germiyan û Kerkûkê, Hewlêr û Koyeyê dema têne Silêmaniyê, qet hest bi xerîbiyê nakin, yanî li dibistanê wek xerîb li zarokên wan nayê temaşekirin, dema ku bi xwe jî diçine bazarê, wek xerîban li wan nanêrin. Xelkê Silêmaniyê mîhrebaniyeke zêde nîşan didin, lewma mafê vî bajarî ye ji bilî, ku jê re bêjin bajarê 'Helmet û Qurbanî ' jê re bêjin; bajarê 'Mîhrebanî û Bedewiyê'."

Çawa ku hûn dizanin, Cemal Axa helbestek li ser Silêmaniyê gotiye û navê beheştê lê kiriye.

Beheştî zatî pakî xwa benawbange leber ciwanî
Kitûmit rengî rêjrawe le ser şêwey Silêmanî

Yanî behiştê rengê xwe daye Silêmaniyê, lewma ev qasî bedew e. Ji ber vê yekê, hêvîdar im ev bajarê qehreman û mîhrebaniyê her tim bedew û xweşiktir be, her tim geş û geştir be û xelkê wê di nav xweşiyê de bijîn.

Zêdetir pêşbikeve, çimkî bi rastî dilê zindî ye Kurdistanê ye, ji bilî ku ji avabûnê ve paytexta kevin a Kurdistanê bûye, navenda hişyarî, geşekirina civakî û pêşketin û rewşenbîriyê bûye, mirov çi qasî pesnê wê bide, dîsa jî kêm e.


Dawî
Îlona 2025'an



Mam Celal

Dema qeydkirina hevpeyvînê

“Hejmarek wêneyên Serok Mam Celal ên kêm hatine dîtin”




Mam Celal û du hevalên wî



Mam Celal û çend kesayetî



Yûsif Zozanî û Mam Celal – Qamişlo 1991



Mam Celal û Newşîrwan Mistefa



Serdana Mam Celal a Çînê
wek Serokkomarê Iraqê



Weşandina nûçeya serdan
Mam Celal
a Çînê û civîna bi serokê wî welatî re
di rojnameya CHINA DALLY de



Şandeya bilnd a Iraqê li Çînê



Mam Celal û Al Gore
(Cîgirê Serokê pêşîn ê Amerîkayê)
24.06.2000



Mam Celal û Şêx Sebah
Mîrê wexerkirî yê Kuweytê



George W. Bush û Mam Celal



Mam Celal û Colin Powel
Wezîrê pêşîn ê Derve yê Amerîkayê
Helebce 15.09.2003



Ji rastê ve:

Rêbwar Star, Burhan Hacî Elî, Mam Celal, Dr. Sacid û Aryan Ehmed Stafa wê demê ya Radyoya Silêmaniyê ya Melbenda Rêxistina YNK'ê

MAM JALAL

IN RESPONSE TO 74 QUESTIONS